

## Hikayeta Keyhana Frenk û Feqe Ehmedê Baban: Mirin Çêtir e ji Fîraqê<sup>1</sup>

İbrahim Tarduş<sup>2</sup>

### Frenk Keyhan ve Feqe Ehmedê Baban Hikayesi: Ölüm Evladır Firaktan

#### Öz

Çaldıran Savaşı'ndan sonraki dönemde Kürt topraklarının büyük bir kısmı Osmanlı'nın müttefiki olan Kürt mirleri tarafından yönetilmeye başlandı. Kürtler ile Yavuz Sultan Selim arasında kurulan ittifak Kanuni Sultan Süleyman döneminde de devam etti. Kanuni, Bağdat'ı fethettikten sonra bu bölgedeki Kürt topraklarının çoğunu Kürtlere verdi. Böylelikle Baban Emirliği, Baban aşireti tarafından Bağdat Paşalığına bağlı olarak yönetilmeye başlandı. Baban aşiretinin adı, emirliğin idaresinden sonra tarihte ön plana çıkmaya başladı. Baban ismi ve Baban Emirliğinin kuruluşuyla ilgili bir hikaye vardır ki aynı zamanda Feqe Ehmedê Baban'ın ülkesini terk edip vuslata ermek için Frengistan'a gidişini konu edinir. Bu hikaye aynı zamanda Doğu edebiyatlarında meşhur olan Şeyh-i San'an hikayesiyle de benzerlikler barındırır. Feqe Ehmedê Baban'ın hikayesi Abdülkadir b. Rustem el-Babanî, Claudius James Rich ve Yamûlkîzade Azîz tarafından yazılmıştır. Yamûlkîzade Azîz, Jîn dergisindeki yazısında kısaca konuya değinmiş; ancak Abdülkadir Rustem-el Babanî ve Claudius James Rich hikayeyi uzun uzun yazmıştır. Hikayenin bu iki versiyonu bazı yönlerden benzer, bazı yönlerden ise farklıdır. Bu çalışmada bu iki varyant benzerlik ve farklılıkları açısından karşılaştırılacaktır.

**Anahtar Kelimeler:** Frengistan, Baban Emirliği, karşılaştırma, varyant, hikaye.

<sup>1</sup> Bu çalışma, daha önce Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından 15-16 Haziran 2023'de düzenlenen Uluslararası Dilbilim ve Karşılaştırmalı Edebiyat Kongresi-'de "Berawirdkirina du Waryantên Hikayeta Avabûna Mîrektiya Baban" adıyla sunulan özet bildirinin genişletilmiş ve gözden geçirilmiş halidir.

<sup>2</sup> Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, [ibrahimtardus1@gmail.com](mailto:ibrahimtardus1@gmail.com), ORCID: [0000-0002-8292-0921](https://orcid.org/0000-0002-8292-0921).

## **The Story of Frenk Keyhan and Feqe Ahmed Baban: Death is Better than Firaq**

### **Abstract**

In the period after the Battle of Çaldiran, most of the Kurdish lands were ruled by the Kurdish Princes as allies of the Ottomans. The alliance that was established between the Kurds and Yavuz Sultan Selim continued during the time of Qanuni Sultan Suleyman. After Qanuni conquered Baghdad, he gave most of the Kurdish lands in this region to the Kurds. The Kurdish region here, Baban Principality, was governed by the Baban tribe and belonged to the Pashalik of Baghdad. The name of the Baban tribe also appeared prominently in history after the administration of the kingdom. There is a story about the name of Baban and the establishment of the Baban Principality. In this story, Feqe Ahmed the Baban leaves his country and goes to Frengistan to reach Keyhan. The story of Feqe Ehmedê Baban also has similarities with the story of Sheikh-i San'an, which is famous in Eastern literatures. Feqe Ehmed story was narrated by Abdulkadir b. Rustem el-Babanî, Claudius James Rich and Yamûlkîzade Azîz. Yamûlkîzade Azîz wrote some things about the subject in his article in Jîn magazine. But Abdulkadir Rustam-al Babanî and Claudius James Rich wrote the story in a long way. These two versions of the story are similar in some ways and different in some ways. In this work, these two variants will be compared in terms of their similarities and differences.

**Keywords:** Frengistan, Baban Principality, comparison, variant, story.

### **Kurte**

Serdema piştî Şerê Çaldiranê piraniya axên Kurdan êdî wek muttefikê Osmaniyan ji alî mîrên Kurdan ve hatin rêvebirin. Tifaqa ku di navbera Kurdan û Yavuz Sultan Selîm de hatibû avakirin di wextê Kanunî Sultan Suleyman de jî berdeham bû. Piştî Kanunî Bexdayê feth kir, wî piraniya erdên Kurdan yên li vê heremê da uhdeya Kurdan. Herema Kurdan li vir bi navê Mîrektiya Baban ji alî eşîra Baban ve girêdayî Paşalîka Bexdayê hate rêvebirin. Navê eşîra Baban jî bi awayekî beloq piştî rêvebirina mîrektiyê di dîrokê de hate xuyan. Li ser navê Baban û avabûna Mîrektiya Baban hikayetek heye ku Feqe Ehmedê Baban di vê hikayetê de ji bo wûslatê ji welatê xwe dertê û berê xwe dide Frengîstanê. Ev hikayet di heman demê de bi hikayeta Şêxê Sen'an re jî hin xalên hevpar dihewîne. Hikayeta Feqe Ehmedê Baban ji alî Abdulkadir b. Rustem el-Babanî, Claudius James Rich û Yamûlkîzade Azîz ve hatiye nivîsîn. Yamûlkîzade Azîz di nivîsa xwe ya kovara Jînê de kêm be jî derbarê mijarê de hin tişt nivîsîne. Lê Abdulkadir Rustem-el Babanî û Claudius James Rich hikayetê bi awayekî dirêjane nivîsîne. Ev her du varyantên hikayetê ji hin aliyan ve dişibîne hev û ji hin aliyan ve ji hev vediqetin. Di vê xebatê ev her du varyant ê ji alî hevşibî û cudahiyan xwe ve bèn berawirdkirin.

**Keywords:** Frengîstan, Mîrektiya Baban, berawirdkirin, varyant, hikayet.

### **Extended Abstract**

In 1514, after the Battle of Chaldiran between the Ottoman and Iranian Empires, Yavuz Sultan Selim had commissioned Idris-i Bidlisi to win over the Kurdish tribes near the Ottoman-Iranian border regions to the Ottoman side. When Yavuz Sultan Selim returned to Amasya from Tabriz, Idris-i Bidlisi set out to meet with Kurdish leaders. After many meetings with Kurdish leaders, Bidlisi convinced most of them to form an alliance with the Ottomans. In fact, the conditions for this agreement were quite favorable. Because when Kurdish leaders had previously tried to meet Shah Ismail, Shah Ismail had imprisoned them. This also showed that a partnership between the Kurds and the Safavids was unlikely. On the other hand, the fact that the Ottomans and the Kurds were Sunni in sect was one of the reasons that brought the Ottoman-Kurdish alliance closer. After the forces of the Ottoman-Kurdish alliance through Bidlisi drove the Safavids out of the Kurdish regions, Kurdish emirs once again became the rulers of their ancestral lands. However, Baban Kurds were not included in this alliance that was formed during the reign of Yavuz Sultan Selim. The participation of the Baban Kurds in the Ottoman-Kurdish alliance was delayed by 20 years. After Suleiman the Magnificent's conquest of Baghdad, mir of Baban Haji Sheikh, who was on his way to pledge allegiance to the Magnificent, was killed on the way. Hearing this, Suleiman the Magnificent gave the rule of the Baban lands to Budaq, the son of Haji Sheikh. From then until 1850, the Baban Emirate was ruled by the Baban tribe. In addition to these historical facts, the Kurds of Baban had a legend about the establishment of their emirate. The legend included the founding of the emirate and was also a love story. According to the story, Feqe Ehmed joined the Ottoman army for jihad. The Ottomans were then at war with the Franks. At that time, before a battle, a soldier from each side could fight one-on-one to decide the winner of the battle. Feqe Ehmed stepped forward on behalf of the Ottomans and faced a Frank. Feqe Ehmed knocked down his opponent in single combat and was about to kill him when he realized she was a woman and spared her life. His opponent then became his spoils of war and the Sultan gave the lands of Baban to Feqe Ehmed. The Emirate of Baban was thus established. Frenk Keyhan and Feqe Ehmed's encounter in the war turned into a love between the two. However, this love did not happen immediately; Feqe Ehmed had to overcome many difficulties to reach Keyhan. According to this story, which can be explained very briefly, the Babans considered themselves the descendants of a European woman warrior. This was quite a different situation compared to other Kurdish dynasties, because Kurdish dynasties have always seen themselves as the descendants of Kurdish-Arab-Persian, that is, influential families or people of eastern origin, and were proud of it. Another interesting point about this story is that it is a love story and what Feqe Ehmed, the hero of the story, did to reach Keyhan. In fact, the relationship between Keyhan and Feqe Ehmed had two phases: firstly, Keyhan fled to Frankistan to live with her family while she was married to Feqe Ehmed out of debt for her life, and secondly, when Feqe Ehmed followed her to Frankistan, she thought that she actually loved Feqe and fled with him from Frankistan. There are

certainly various versions of this story told among the people, but there are two variants that have survived in written form and are written in detail. The first was written by Abdulkadir b. Rustam al-Babanî, a Kurd, and the second by the Englishman Claudius James Rich. When both variants are analyzed, it is seen that there are similarities and differences between them. Although the main body of the variants is the same, the plot and the characteristics of the characters differ from each other. In our study, after summarizing the main outlines of both variants, the similarities and differences will be analyzed using the comparison method.

## Destpêk

Dema dîroka xanedanên Kurdan bê xwendin mijara eslê xanedanên Kurd wekî mijareke balkêş dertê pêş. Balkêşiya mijarê ew e ku eslê hin xanedanan wekî ne ji nijadeke Kurd hatine qeydkirin. Lê ev tişt ji bo xanedanan ne tişteke biçûkdîtîne bereksê vê wekî tişteke serbilindî û mexrurîyetê hatiye nîşandan û ev ji alî xanedanan ve jî hatiye qebûlkirin. Bo nimûne dîroknûsê fermî a Mîrekiya Hekariyê Temexanê Yazîcî gava dîroka mîrên Hekariyê nivîsiye di beşa sedema nivîsandina pirtûkê de diyar kiriye ku ew ê dîroka “Ebbasiyan” binivîse (Yazîcî, 2022: 55). Helbet ji vir qesda wî ji Ebbasiyan mîrên Hekariyê ye. Diyar e ku ev tişt ji alî malbatên xanedanan ve jî wekî serbilindî û eslbûnê hatiye dîtin û wan ji bo meşrutîyeta xwe ya dînî vê çîroka nijadî bi kar anîye. Herweha Ebbasbûn di heman demê de dihat wê wateyê ku ew ji nesla Peyxember in û pîroz in. Bo nimûne dema seyyahên sedsala XIX. behsa mîrên Behdînanê dîkin dibêjin, wîsa tê qebûlkirin ku nijada mîrên Behdînanê digihe xelîfeyên Ebbasiyan. Ji ber vê xelk gelek rêza wan digire û wan wekî kesên pîroz dibîne. Ew, dema dertên derve wekî xelîfeyên dawîn ên Ebbasiyan rûyê xwe dipoşin (Ainsworth, 1842: 197; Kinneir, 1818: 456; Rich, 1836: 153-154; Tarduş, 2022: 30). Tê dîtin ku xanedanên ku eslê xwe digihînin xelîfeyên Ebbasiyan di civakê de qedr û qîmete xwe ya mezin hene. Helbet ev di heman demê de rêza xelkê bo dînê Îslamê jî nîşan dide. Ji bilî Behdînan hin xanedanên din jî hene ku wekî Ebbasî tîne dîtin. Ji van du heb yê Hekarî û Kîlîsê ne ku di heman demê de nesla wan ji sê birayan hatiye. Ji wan pêştir mîrên Çemîşgezêkê û Mirdasiyan jî wekî Ebbasî tîne dîtin. Ji xeynî van mîran, xanedaneke din heye ku xwe digihîne xelîfeyan; lê vê carê ne xelîfeyên Ebbasî lê xelîfeyên Emewîyan, ew jî mîrên Silêmanî yê derdora Qulp, Batman û Meyafêrîqînê ne. Dîsa ji bilî van gelek nimûneyên dî hene di Şerefnameya Şerefxan de: Mîrên Cîzîrê ji nesla Xalid bin Welîdê qumandanê nasraw ê fethên Îslamî, mîrên Zirkî ji seyîdekî Şamê ku wekî Şêx Hesênê Ezraqî nasraw e, mîrên Sûwedî ji malbata Bermekiyan ku wezîrên xelîfeyên Ebbasiyan bûn, mîrên Sason û Bedlîsê ku pismamên hev in, ji qralên seraya Kîsrayan. Helbet xanedanên ku ji binemala Kurdan tîne jî hene wekî mîrên Şîrwanê, melîkên Hesênkeyfê, mîrên Erdalanê, mîrên Mekrî û mîrên Bradostê (bnr. Bedlîsî, 2014).

Tê dîtin ku gelek xanedanên Kurdan ji alî eslî ve an wîsa hatine qeydkirin an jî xwe wîsa dibînin ku eslê wan digihe malbat an kesekî Ereba ji alî dînî ve nasraw û payebilind e, an jî xanedaneke Fars ku bi payebilindiya xwe ya îdarî derketiye pêş. Ev mesele heta sedsala XIX. jî fenomeneke belav bû. Gelek caran xwe hesibandina ji nesla Ereban ji bo netewetiya Kurdî nedibû pirsgirêk. Bo nimûne Mela Mehmûdê Bazîdî Kurdan Erebnijad û zimanê wan wekî Erebnijad nîşan dabû (Bazîdî, 2010: 47-48). Jê pêştir Şeyh Ubeydullahê Nehrî jî gava xwestibû serbilindî û wêrekiya Kurdan nîşan bide, eslê Kurdan gihandibû Ereban. (Nehrî, 2022: 230) Diyar e ku ev fikrîyat li gor wan deman, ciyê şanazî û serbilindiya netewî jî bû û ev tişt ne tenê ji bo Kurdan derbasdar bû. Bo nimûne, Abdurrezzak Begê Dunbulîyê dîroknûsê dewra Xanedana Kaçarên Tirknijad, eslê Kaçaran gihandibû Keykavûs û Cemşîd ku ew padîşahên Îrana berî Îslamê ne (Başçı, 2019: 85).

Kesên ku li ser sedema nijadeke qedîm an dînî a Kurdan sekinînê, Metin Atmaca û İbrahim Bozkurt in. Li gorî Atmaca dema xanedanên Kurdan binemala xwe digihandin malbat û kesên navborî, dixwestin ku îktîdara xwe ya sîyasî meşrû bikin (Atmaca, 2015: 37). Li gor Bozkurt jî sê sedemên bingehîn ên vê meseleyê hebûn. Sedemên psîkolojîk, sosyolojîk û dînî. Ji alî psîkolojîk ve: Ew xanedanên ku dihatin û eşîrên Kurdan bi rê ve dibirin, ne xanedanên ji rêzê bûn û di desthilatdariyê de serdest bûn. Ew dihatin, wekî kesên ji eşîrên Kurdan tevdiqeriyên û rêveberiyê dikirin. Eşîrê jî tecrubeya wan a sîyasî, cîvakî û ekonomîk îstîfade dikir. Ji alî sosyolojîk ve: Ew xanedanên ku di rewşên aloz de hawara xwe dibirin eşîrên Kurdan ji alî eşîrê ve dihatin qebûlkirin. Ew xanedan ji bo her malbatekî eşîrê di heman mesafeyedê bûn. Ji vê alî ve wekî hevseringiya eşîrê dihatin dîtin û rê li ber şerên navxweyî digirtin. Ji alî dînî ve: Di alema îslamê de hin malbat hebûn ku ji alî wesfên xwe ve derketibûn pêş û ji alî herkesî ve rêza wan dihat girtin. Ji ber vê jî ji bo Kurdan ne cîyê şermê bu ku di bin hikmê wan de bijîn (Bozkurt, 2022: 512-514).

Sedem çî dibe bila bibe ev rastîyek e ku xanedanên Kurdan dema xwe digihandin malbateke payebilind xwe bi vê tiştê serbilind didîtin. Heman mesele bo Kurdên reaya jî derbasdar bû û wan jî ji ber vê taybetiya xanedanên xwe rêza wan digirtin û ew bo xwe wekî rêvebir qebûl dikirin. Sedemên vê rewşê helbet hewceyê hin lêkolînên din e. Lê ji bo ku sînore xebata me hineke din berfirehtir nebe, em vê nîqaşê li vir bihêlin û derbasî Mîrekiya Baban bibin ku ji alî nesla xwe ve, ew xwe digihînin jineke Ewropî û li ser vê jî xwedî hikayetekî ne.

### 1. Mîrekiya Baban

Li gori Abdulqadir b. Rustem el-Babanî neql dike avakar û yekem şahê Sasaniyan Erdeşîrê Babekan (224-241) di salên pêşîn ên hikimdariya xwe de bi Kurdan re şer kiriye. Herçiqas artêşa Şah du sê caran paş ve kişiya be jî di dawiyê de şevêkê êrîşê Kurdan kiriye û ew têk birine. Di serî de gelek kes hatine kuştin; lê di dawiyê de Erdeşîr fikra xwe guhertiye û Kurdan re aşîtî ava kiriye. Piştî aşîtiyê Kurdên firar jî dîsa vegeyane herema xwe. Bi emrê Erdeşîr li heremê bajarek ava kirine. Ji ber ku di avakirina bajêr de gelek zorî derketiye Ardeşîr navê bajêr daniye Şehrezor. Paşî yek ji Kurdan wek hikimdarê Şahrezorê tayîn kiriye û şeş mehan li Şahrezorê maye û vegeyaye. Piştî wê her dem meqam û mertebeya Kurdên Şahrezorê xwedî ciheke xwe ya taybet hebûye (el-Babanî, 2019: 127-130; Karname, 1966: 228-230). Ji vir tê fehmkirin ku bavûkalên Babanan û Kurdan herî kêr ji sedsala III. ve li ser axa xwe xwedî hikumet bûn ji ber ku Erdeşîrê Babekan di 226an de wekî şah bûye xwedî tac (Naskalî, 2024). Baban piştî agahiyên derbarê avabûna Şehrezorê dibêje navê hikimdarên Kurdan heta Safeviyan di pirtûkên dîrokê de nehatibûn qeydkirin lewra nediyar bûn. Yekem hikûmeta ku dihat zanîn di dewra Feqe Ehmed de ava bibû (el-Babanî, 2019: 130). Lê Herçiqas Babanî hikimdarên Babanan heta Safewîyan ji ber neqeydkirina wan wekî meseleyeke mechûl nîşan dabe jî hin agahiyên din hene ku berî Safewîyan jî hebûna hikimdarên Baban nîşan didin. Avabûna Mîrekiya Baban wekî mîrekiyên din ne zelal e, lê dîsa jî hin agahî

hene ku hebûna mîrekiyê ya berî avabûna Safewîyan piştrast dikin. Li gorî Said Abdulsamed Said Salih Tudarî ku wî berhema xwe 80 sal piştî Şerefnameyê nivîsiye, du caran behsa mîrekiya Babanan dike û di belgeyêke 1276an de destnîşan dike ku navê Xalid Ahmedê Baban derbas dibe (Ghalib, 2011: 55).

Piştî Kanunî Sultan Suleyman (1520-1566) berê xwe dide Bexdayê û Bexdayê feth dike, navê Babanan û mîrekiya wan di belgeyan de zêdetir tê xuyan. Çawa Şerefxanê Bedlîsî dinivîse Mîrekiya Baban bi dilxwazî tevî Osmanî dibe. Wan çaxan mîrê Babanan Hecî Şêx e. Navbera Şah Tahmasbê Şahê Safewîyan (1524-1576) û Hecî Şêx ne baş e. Şah Tahmasb sê caran leşker şandine ser Baban lê Babanan ew têk birine. Dema Kanunî Sultan Suleyman derketiye sefera Bexdayê û Bexdayê standiye yanî di 1535an de, Hecî Şêx ji bo bikeve xizmeta Kanunî dertê rê lê di rê de tê kuştin. Kanunî vê dibihîze û mîrekiya wîlayeta Babanan dide kurê wî Budaq. (Bedlîsî, 2014: 330).

Paytexta Babanan heta 1781ê Qereçolan bû, lê piştî avabûna bajarê Silêmaniyê ew der bû paytexta mîrekiyê (Behn, 2024). Erdên Babanan li herema Şehrezorê bû û ew ji alî îdarî ve girêdayî Eyaleta Bexdayê bûn. Diyar e ku ji alî Osmaniyan ve gelek qedrê wan dihate girtin ku Osmanî unvana begî û paşatiyê dabûn wan. Heta 1850an Babanan mîrekiya xwe bi rê ve bir, di 1850an de Ahmed Paşa ji text hate dûrxistin û dawî li Mîrekiya Baban hat (Atmaca, 2022: 71; Ghalib, 2011: 191). Piştî hilweşîna mîrekiyê hin mensûbên Baban hatin sirgûnkirin û ji axên xwe hatin dûrxistin, lê wan elîtbûna xwe ji dest bernedan, pêşî bûn elîtên Osmanî paşî jî elîtên Cumhuriyetê (Ates, 2021: 93).

## **2. Hikayeta Avabûna Mîrekiya Baban angî Hikayeta Evîna Frenk Keyhan û Feqe Ehmed**

Ev hikayeta ku em di xebata xwe de li ser disekinin, çawa Metin Atmaca jî diyar dike ji aliyekî xwe ve têra xwe balkêş e. Digel ku hema bibêje bê îstîsna hemû malbatên xanedanên Kurdan xwe bi nijadeke pîroz a dîni an nijadeke biesl a Rojhilatî ve girê didin; lê Baban nijada xwe keseke jin û Ewropî ve girê didin (Atmaca, 2015: 37-38). Herçiqas ev hikayet xwedî taybetiyên efsanewî be jî em ji seyhatnameya Rich fehm dikin ku Babanî baweriya xwe bi vê hikayetê tînin û di heman demê de pê serbilind in jî (Rich, 1836: 299). Herweha ev hikayet kakila rasteqîniyê dihewîne ku ji alî dîroknasan ve Feqe Ehmed û ahfadê wî wekî Babanzadeyên duyem têne nasîn (Başçı, 2024: 9).

Ev hikayet ji du alîyan ve dertê pêş. A yekem ew e ku behsa avabûna Mîrekiya Baban dike û a duyem jî ew e ku ev behsa evîna Frenk Keyhan û Feqe Ehmedê Baban dike. Di serencama hikayetê de Frenk Keyhan dev ji Feqe Ehmed berdide û berê xwe dide welatê xwe angî Frengîstanê. Feqe Ehmed mirina xwe dide pêşiya xwe; lê ji evîna xwe venagere û ew jî pey Keyhan berê xwe dide Frengîstanê. Di rê de rastî gelek zehmetiyan tê; lê dawiyê de digihe yara xwe û ew her du bi hev re vedigerin. Diyar e ku Feqe Ehmed xwedî evîneke mezin e û tehemmûla wî ji bo firaqê tune û ji bo wûslata yarê her tiştî dike.

Çawa Kurnaz jî destnîşan dike, aşiq ji bo yara xwe amade ye her tiştî bike û her tiştê xwe di rêya yara xwe de feda bike. Di vê rewşê de êdî melanet hakimê aşiq e û ew nafikire ka kê ê çi bibêje û hemû endîşeyên xwe li pey xwe dihêle (Kurnaz, 2010: 51). Feqe Ehmed jî aşiqekî wisa ye ku dema seh dike Keyhan çûye, qet li tiştêkî nafikire, melanet lê hakim dibe. Ji vî alî ve dema bê fikirin serboriya Feqe Ehmed serboriya Şexê Sen'an bi bîr dixe. Çawa tê zanîn Şexê Sen'an pîreke xwedî kemal e, çar sed heb mirîdên wî hene û pêncî salan li Harem-î Şerîf şêxî kiriye. Şêx çend şevan li ser hev di xewna xwe de dibîne ku li welatê Rûmiyan pûtperestiyê dike. Piştî vê xewnê bi mirîdên xwe re berê xwe dide Romê. Li wir keçikeke Xrîstîyan dibine û aşiqê wê dibe. Di hin vegêranan de welat Ermenîstan û keçik jî keçeke Ermenî ye, ku Şêxê Sen'an nûra Xwedayî di rûyê wê de ditiye. (Filiz, 2024: 78) Keçik jê dixwaze ku li ber pûtê secde bike, mishefê bişewtîne, şerabê vexwe û dev ji misilmantiyê berde. Ev ji bo Şêx tiştên gelek zehmet in. Lê Şêx vexwarina şerabê qebûl dike. Gava şerabê vedixwe, işqa wî zêdetir dibe û ji bo keçika Xrîstîyan dev ji dînê xwe berdide û dibe Xrîstîyan. Paşî keçik jê dixwaze ku bibe şivanê berazan û ew salekî şivantiya berazan dike. Di maweya şivantiyê de êdî mirîdên wî fehm dikin ku nikarin Şêxê xwe ji vê rêyê vegehrînin, bi izna Şêx vedigerin. Gava ew vedigerin, miridekî Şêx dibînin ku di wextê sefera Şêx de li Mekke'yê mabû. Ew mirîd ji wan pirs dike ka çi hal û ehwalê Şêx e. Mirîdên di hal û ehwalê jê re dibêjin. Mirid bi wan re dixeyide û dibêje, we çawa şêxê xwe di wê halê de hiştiye. Ew tev bi hev re berê xwe didin Romê û li wir çil rojan dûayê ji Xwedê dikin ji bo Şêx. Paşî Peyxember tê xewna mirîd û mizgîniya bixwevehatina Şêx dide wî. Mirîd diçin ba Şêx dibînin ku Şêx dîsa bûye Misilman. Paşî ew tev bi hev re vedigerin. Piştî vegehrê keçik xewn dibîne û fehm dike ku divê li pey Şêx here. Berê xwe dide çol û çiyayan û li Şêx digere. Ev tişt wekî îlham bo Şêx tê şandin ku keçik dev ji Xrîstîyanîyê berdaye û li Şêx digere. Şêx radije mirîdên xwe û lê digere. Wê li çolekî di halekî perîşan de dibînin. Keçik ji Şêx dixwaze ku Îslamê bo wî vebêje, Şêx Bo wê behsa Îslamê dike. Keçik bawerî bi Xwedê tîne û dibe Misilman. Lê hewqas li pey Şêx li çol û çiyayan geriyaye bêzar ketiye û piştî dîtina Şêx miriye. (Başçı & Başçı, 2023: 36-38; Attar, 2023: 156-186).

Xalên hevpar ên vê hikayetê û hikayeta Feqe Ehmed ev in:

1. Mijara her du hikayetan jî işqa heqîqî ye. Herçiqaş hikayeta Şêxê Sen'an ji alî simbolîzma tesevvûfî ve ji aliyên cûrbecûr hatibe şîrove kirin jî, ew keçika ku Şêx aşiqê wê bûye, xwoşewîsteke wisa ye ku em di işqên dinyewî de rastî tînin. Herweha işqên heqîqî ku di edebiyatên rojhilatê de tînin dîtînin tradîsyoneke wisa ye ku li coxrafyaya Babanan cিয়ে xwe ya qewî heye. Ev tradîsyoneke wisa ye ku koka wê digihije vegêranên Medî. Ev vegêranên eşqî ku bi piranî bi xewnekî dest pê dikin, di nav Medan de bi hikayeta Odatîs û Zeryadresê dest pê kiriye û paşî di nav civakên cînar de belav bûye. Bo nimûne, mînakeke ve çîrokê di Şahnameya Firdewsî (m. 1020) de bi hikayeta Geştasp û Ketayûnê xwe nîşan dide. Paşî em di Husro û Şîrîn a Gencewî de rastî heman temayê tînin ku Xwoşewîst/Şîrîn di vê hikayetê de jî Xrîstîyan e. (Urmevî, 2011: 12-16) Ji ber vê dikare bê gotin ku ehfadên



Feqe Ehmed vê bûyera rasteqîn veguherandine hîkayeteke aşiq û maşûq ku ev tradîsyoneke qedîm a wê coxrafayê ye.

2. Her du aşiq jî kesên olî ne. Feqe Ehmed Feqe ye û Şêxê Sen'an jî şêxeke mezin û kamil e.

3. Di her du hîkayetan de jî maşûk Xrîstîyan in.

4. Di her du hîkayetan de jî aşiq mecbûr mane ku hin zehmetiyan bikişînin. Şêxê Sen'an bo işqa xwe dîn guherandiye, şerap vexwariye û şivantiya berazan kiriye ku ev tev ji bo şêxekî rewşên ji mirinê xirabtir in. Feqe Ehmed jî dema Keyhan vegeyriyaye Frengîstanê bi tena serê xwe berê xwe daye Frengîstanê rê de ji mirinê filitiye; lê venegeriyaye û li welatekî xerîb ji dawetê Keyhan revandiye ku ev helwesteke gelek zehmet e.

Hîkayeta ku em ê berawirdkirina du varyantên wê bikin helbet xwedî hin varyantên din e jî. Bo nimûne çawa ku Yamûlkîzade Azîz di hejmara nehem a kovara Jînê de nivîsiye Feqe Ehmed di şerekî de bi siwariyên xwe yên Darîşmanayî re alîkariya hikûmeta Îranê kiriye û di şer de qehramaniya xwe nîşan daye, lewra hikîmdarê Îranê ji bo wî taltîf bike jê re gotiye "Baba, Baba". Piştî jî leqeba malbatê wisa maye. Yamûlkîzade îddîa dike ku ev agahî di pirtûkeke li kitêbxaneya mezin a Camîya Süleymaniyyê nivîsî ye. Disa çawa ku ew neql dike di nav Kurdan bi awayê devkî versiyoneke din ji belav e: Feqe Ehmed tevî şerê Rûs û Îranê bûye û prensesekî Rûs wekî êsir girtiye. Gava ji bo zewacê çûye ba babê prenses ku jê îcaze bixwaze babê prensesê jê re gotiye "baba" (Yamûlkîzade, 1919: 4). Her çiqas neqla Yamûlkîzade varyanteke kamil nîşan nede jî hin kakilên sereke yên hîkayetê dihewîne. Tiştê balkêş a neqla Yamûlkîzade ew e ku Feqe Ehmed ne di şerê Osmanî û Frengan de, di şerê Îran û Rûsan de şer dike û alîkariya Îranê dike. Di vir de keçika êsir ku Feqe Ehmed dixwaze pê re bizewice jî Rûs e. Diyar dibe ku varyant kakilê hîkayetê diparêzin; lê teferrûat diguherin. Tabî Yamûlkîzade van agahiyan wekî bersîveke Doktor Friç dinivîse (Atmaca, 2015: 38). Ku Doktor Friç navê Babanan wek Bebe bi kar anîbû û ji ber vê hindê wan wekî Tirk nîşan dabû (Friç, 2014: 141). Piştî van agahiyan niha em ê kurtiya her du varyantan bidin û paşî wan berawird bikin.

### 2.1. Varyanta Babanî

Feqe Ehmed li gundekî bi navê Darîşmanayê dijîya. Mirovekî feqe, abîd, zahîd û feqîr bû. Lê camêr, egîd û şervanekî baş bû. Wê demê Osmanî bi Frengan re şer dikir. Feqe Ehmed jî ji bo cîhadê tevî wê şerê bûbû û di şer de hemû maharetên xwe nîşan dabû. Piştî şer wekî ganîmet keçikeke pir delal bûbû para Feqe Ehmed. Keçik bi daxwaza xwe bûbû misilman û bi Feqe Ehmed re hatibû Darîşmanayê.

Feqe û Keçik li Darîşmanayê dizewicin. Lê bi xwestina keçikê salek nêzîkê hev nabin. Rojekê xwesûya wê xeberên nexweş dibêjê keçikê. Keçik jî li ber xwe dikeve. Çekên xwe girê dide li hespa xwe siwar dibe û dibêje xwesûya xwe: Bibêje

kurê xwe bila li pey min newe, ez vedigerim welatê xwe eger li pey min were ew ê bê kuştin. Xwesûya wê herçiqas lava jê bike jî ji bo neçûna wê, ew diçe. Gava êvarê Feqe tê malê, diya wî hal û meseleyê jê re dibêje. Feqe ji hiş diçe. Dema şîyar dibe hema demildest li hespê xwe siwar dibe û li pey keçikê diçe. Piştî deh rojan digihê û dibêjê: Ey bîwefa, tu çima zilmeke wisa li min dikî, vegere, ez nikarim bê te bijîm, heta ez sax bim ez nikarim te ji bîr bikim. Keçik dibêjê: Ji min dûr bisekine, nexwe ez ê şûra xwe bi xwîna te av bidim. Lê Feqe venagere. Keçik êrîşê Feqe dike û Feqe ji hespê dikeve erdê û ji hiş diçe. Keçik hinek li ber serê wî digirî. Serê wî dêtîne cîyê nerm kîsek zêr dêxe bin serê wî û bi rê dikeve. Feqe dotira rojê şîyar dibe vedigere gundê xwe gava baş dibe bi ser xwe ve tê dîsa berê xwe dide Frengîstanê, welatê keçikê. Piştî rêwîtiyê dirêj digihe welatê keçikê. Li wir li ba jînepîrekê dimîne. Rojek ji jînekê dipirse ka kesekî ku sala din bûbû êsîrê misilmanan kes vegeriya an na? Jînepîr dibêje: Berî sê çar mehan keçikek vegeriya vêga jî dixwazin wê bi pismamê wê re bizewicînin, lê keçik bi vê ne razî ye û her daîm melûl û xemgîn e, lê sedema xemgîniya wê jî ne diyar e. Gava Feqe vê dibihîze. Ji jînepîr re ya dilê xwe dibêje. Dibêje, ez jê hez dikim û ez li pey wî heta vê derê hatime. Û hemû meseleyê ji serî ve jê re vedibêje. Û her dû bi hev re digrîn. Jînek dibêje nîşaneyek bide min da ku ez nîşanê wê bidim eger ez hezkirina te pê re bibînim ez ê pê re bixivim eger na naaxivim. Li ba Feqe tenê gustilek heye ku aîdê keçikê ye. Gustîlê dide jina pîr û jê dixwaze ku bide keçikê. Jina pir dotira rojê diçe ba keçikê. Dibêje tu dîsa xemgîn î, xêr e sebaba xemgîniya te ew kurikê misilman e, qey? Eger ez jê xeberek bidim te tu yê çî bidî min? Keçik dibêje: Qesem bi navê Mesîh, eger tu tiştê zanibî û ji min re bibêjî tu çî bixwazî ez ê bidime te. Jina pîr, hal û meselê ji keçik re vedibêje. Keçik gava seh dike gelek digrî. Keçik kîsek zêr dide jînekê û dibêje: Ez poşman im, bila min efû bike lewra ku min bo wî bêtaatî kir û li hember Xwedê jî nankorî. Vê kîsê here bide wî, bêjê bila ji bo min hespeke rewan bistîne. Jînek tê malê û mizgînî dide Feqe. Gelek kêfa Feqe tê, dotira rojê hespeke rewan dikire, amadekariya xwe dike û li benda xebera xêrê disekine.

Pismamê keçikê tê mala wan û dîsa wê wisa xemgîn dibîne xwe aciz dike, dibêje: Madem te hewqas ji wî misilmanî hez dikir, tu nevegiriyabûnayî. Xwe bide hev, nexwe ê xwîna te şûra min av bide. Keçik gelek diqehire; lê dengê xwe dernaxe. Du sê roj şûnde hinek zêran ji bavê xwe distîne. Ji jînepîr re dibêje ji xorto re bêje, bila sibê êvarê derê derveyê bajêr li filan cîyî li benda min bisekine. Feqe evarê dertê û li benda wî disekine, keçik bi halekî rextgirêdayî tê ba wan. Feqe ji keyfan digrî. Her du, sê sed zêr didine jînepîr û direvin. Dotira rojê gava li qûntara çiyayekî bêhna xwe vedidin, dibinin ku bi pey wan ketine û tînan wan bikujin. Keçik hêvî û zariyan ji Feqe dike dibêje tu newe ez ê herim meseleyê hal bikim. Keçik dertê pêşîya pismamê xwe û sed leşkêrên wî. Êrîşa pêşîn li pismamê xwe dike bi şûrê wî dike du şeş û gelek leşkeran dikûje yê din direvin, keçik vedigere ba Feqe. Ew dîsa bi rê dikevin û vedigerine Darişmanayê. Gava diya Feqe wan dibîne pir kêfa wî tê. Li gund ji bo hatina wan ziyafet tê dayîn. Piştî vegere nêzîkê salekî jina Feqe zarokê tîne dinyayê, navê wî dêtinine Sileyman. Paşî kurekî wan ê din çêdibe navê wî jî dêtinin Abdullah.

Sileyman gava mezin dibe her rêberiyê li hevalên xwe dike. Gava dibe hejdeh salî babê wî dimire, du salên din jî diya wî dimire. Sileyman dikeve şûna babê xwe û piştê dibe mîrê gund û heremê. Pê re pê re sînoren xwe fireh dike û dibe kesekî nasraw.

Wan çaxan dîsa Osmanî û Frenk di şer de ne. Sileyman jî wekî babê xwe diçe cîhadê. Çil siwarî jî pê re ne. Di şer de bi xêra Sileyman Beg Osmanî bi ser dikeve. Gava serbazê Osmanî vê dibihîze gazî Sileyman dike, dibêje ka tu kî yî, ji ku yî? Sileyman Beg dibêje: “Navê min Silêyman e, ez xelkê Kurdistanê me.” Serbaz piştî vê bi Tirkî dibêje “Babam Süleyman, Babam Süleyman!” paşî êdî ew wek Sileyman Baba tê nasîn û jî zurriyeta wî re jî dibêjin “Baban” Serbaz behsa qehremanî û dîlêriya wî ji Padişah re dike. Padişah jî bi fermanekî herema wî ango herema Baban wekî îqta dide wî. Sileyman Beg jî vedigere axên xwe. Sileyman Beg ji 1572an heta 1589an dibe mîrê Baban sinoren xwe heta Bilbas û herema Mukriyan fireh dike. Berî mirina xwe kurê xwe Ferhad Beg wek xelefê xwe diyar dike. Dema ew digihîje rehma Xwedê Ferhad Beg dikeve şûna wî (el-Babanî, 2019: 130-136).

## 2.2. Varyanta Claudius James Rich

Cladius James Rich yek ji wan kesan e ku di sedsala XIX. de hin cihên Kurdistanê geriyaye, çavdêrî û têbiniyên xwe di seyahatnameya xwe de nivîsandîye. Seyahatnameya Rich piştî Mirina Rich ji alî jina wî ve hatiye amadekirin û weşandin. Teybetiyeka Rich a wî ji seyyahên din vediqetîne ew e ku ew ne tenê ji Kurdistanê derbas bûye ew di heman demê de wextekî dirêj li Kurdistanê maye. Ji ber vê mana wî ya dirêj wî karîbûye gelek kitekitan bi dest bixe û çavdêriyên kûr bike. Ew bi taybetî li Silêmanî wekî mêvanê Mahmûd Paşayê Baban maye û demekî jî çûye Sinê. Ji ber ku ew nûnerê East Indian Company ya şirketa mezin a Britanyayê a Bexdayê bû. Wekî dîplomatekî digeriya û wisa jî dihat pêşwazîkirin. Ji ber vê rewşê jî wî hem paytext û seraya Mîrektiya Baban him jî li peytext û seraya Mîrektiya Erdelan dîtibû. Axirî wî di seyahatnameya xwe de gelek keresteyên kêrhatî ji bo xebatên Kurdolojiyê hiştine. Yek ji van keresteyan jî hikayeta avabûna mirektiya Baban e ku wî jî ji gundiyekî Darîşmanayê bihistiye û bêyî ku lê zede bike an jê kêma neqil kiriyê. Li gorî neqla Rich ev hikayet dikare wisa bê kurtekirin: Li Darîşmanayê du bira dijiyan, navê yekî Feqe Ehmed, navê yê din jî Xidir bû. Van her du birayan ji destê Bilbasiyan gelek zilm dîtibû. Feqe Ehmed jî vê rewşê aciz bû ji gundê xwe derket çû Stenbolê û go: Heta ez tola xwe hilnedim ez venagerim. Dema ew çû Stenbolê Osmanî bi Frengan re di şer de bû, Feqe Ehmed jî tevî vê şerê bû. Wan çaxan şer bi piranî bi awayekî yekoyeko dihate kirin. Li alîyê Frengan kesek hebû ku pênc rojan palewanên Osmanî têk biribû. Feqe Ehmed daxwaz kir ku pê re yekoyeko şer bike. Piştî Padişah lê guhdar kir hin bû ka ji ku ye, çî kes e, daxwaza wî qebûl kir. Feqe Ehmed derket meydanê û şovalyayê Freng têk bir. Feqe gava ji hespa xwe pêya bû ku serê şovalyayê jê ke, dît ku ew şovalyê keçik e. Keçikê hevî û zariyan pê kir ku wê bibexşe û pê re bizewice. Feqe Ehmed qebûl kir. Padişah ji bo vê qehremaniya wî xwest wî xelat bike. Feqe Ehmed ji Padişah xwest ku wî wek Mîr tayîn bike û erdên Darîşmanayê bo wî bibexşe. Paşî ew û jina xwe

vegeriyan Darişmanayê. Du zarên wan çêbûn. Navê wan Sileyman û Bûdaq Keyhan danîn.

Feqe Ehmed bi Bilbasiyan re gelek caran şer kir û gelek ji wan kuşt. Gava rojek Feqe ne li mal bû Bilbasiyan êrîşê mala wî kir. Wê çaxê Keyhan li mal bû. Keyhan li hemberî 400-500 merî şer kir û gelek ji wan kuşt. Paşî xelkên gund civand û ji wan re go: Feqe Ehmed canê min bexşandibû. Min jî îro deynê canê xwe da, yegane daxwaza min jî ev bû. Tiştê ku we dîtine, bibêjine Feqe Ehmed û bibêjinê ez ê niha biçime ciyeke wisa ku ew careke din min nebîne. Ji bo ku ew li pey min newe ez wî îqaz dikim. Eger ew li pey min were ez ê zerarê bidimê. Paşî li hespa xwe siwar bû û çû. Gava Feqe Ehmed hat, hal û meselê jê re gotin. Feqe Ehmed li pey wê çû. Li nêzîkê Pişderê gihiştê Keyhan. Hêvî û zariyan kir ku pê re vegere. Keyhan qebûl nekir, go: Ev ne mimkun e. Tu misilmanî ez jî Frenk. Ez ê vegerim welatê bavûkalên xwe. Xwe nêzîkê min neke, nexwe ez ê zerarê bidim te. Lê Feqe hê jî hêvî û zariyan dikir. Keyhan bi şûra xwe ew birîndar kir û çû. Lê gava çû fikirî ku Feqe Ehmed him bavê zarên wê ne him jî canê wê bexşandiyê. Ji ber vê vegeriya hate ba Feqe Ehmed. Feqe Ehmed nemiribû, hê jî nefes distand. Keyhan birîna Feqe derman kir, ciyê wî xweş kir. Heta hinek bigihîştana Feqe ew derman ê wî zindî bigirta. Keyhan gava ev fehm kir dîsa bi riya xwe ve çû. Feqe Ehmed gava hate ser hemdê xwe, li pey Keyhan çû û gihiştê Frengîstanê. Gihiştê bajarekî ku dengê dawetê jê tê û amadekariya zewacê lê tê kirin.

Feqe Ehmed fikirî ku xwe li ber bayê felekê serbest bihêle. Hespê wî li ku bisekiniya ê li wir bimaya. Hespê wî li ber mala jînepîrekê sekinî. Feqe Ehmed çû mala jînepîrê. Jê pîrsa vê şahiyê kir. Jînepîrê gotê: Berî salan keça qral tevî şer bûbû ku misilmanan re şer bike. Piştî vê şerê kesî qet xeberek jê nestandibû. Ev dawet jî daweta wê û pismamê wê bû. Feqe Ehmed jê lava kir ku ew riya tevîbûna dawetê bo wî peyda bike. Jînepîrê go: Ancax tu bikevî dilqê jinan em dikarin te bibine dawetê. Feqe li dawetê çû nêzîkê Keyhan gotê: Hûn di nav misilmanan de girtî bûn. Keyhan bî xemgînî û bi Kurdî gotê: Ax, Feqe Ehmed tu li vir î. Paşî Feqe Ehmed derkete meydanê, zavê kuşt û bûkê revand. Ew bi hev re çûne Stenbolê. Padîşah li wir gelek diyariyan da wan. Feqe û Keyhan bi hev re vegeriyan Pişderê. Feqe berî mirina xwe erdên xwe firehtir kir û xist bin hikimraniya xwe. Piştî wî kure wî Baba Sûleyman bû Mîrê nû (Rich, 1836: 292-297).

Rich dibêje min heman hikayet ji Mehmûd Paşa jî guhdarî kiriye. Disa jinan bi heman şekî hikayetê ji Xanima Rich re vegotine. Heman demê de kesekî nêzîkê sedsalî bi navê Ehmed heye ku behsa vê hikayetê ji Rich re kiriye; lêbele ji ber emrê xwe agahiyan tevîhev kiriye (Rich, 1836: 299).

Tablo 1. Cudahiyên di navbera varyanta Babanî û varyanta Rich de

Bûyer	Varyanta Babanî	Varyanta Rich
Terkkirina Darişmanayê	Feqe Ehmed ji bo tevlibûna cîhadê Darişmanayê terk dike.	Feqe Ehmed ji ber zilma Bilbasiyan Darişmanayê terk dike.
Tevlibûna şerê Osmanî-Frengan	Feqe Ehmed di şer de qehremanî û wêrekîyên mezin nîşan dide. Keyhan dawiya şer de wekî xenîmet dibe para wî.	Feqe Ehmed di şerê yekoyeko de şovalyeyekî têk dibe. Berî ku şovalyayê bikuje Şovalye keçik dertê. Keyhan jê bexşînê dixwaze.
Reva Keyhan ji Darişmanayê ber bi Frengîstanê ve	Li gorî Babanî xwesûya Keyhan tiştên nexweş jê re dibêje. Keyhan aciz dibe li ber xwe dikeve û vedigere Frengîstanê.	Bilbasî êrîşê Darişmanayê dikin. Keyhan bi tena serê xwe Darişmanayê diparêze û xwe wek deynê xwe dayî dihesibîne. Lewra vedigere Frengîstanê.
Revandina Keyhan ji Frengîstanê	Keyhan bi alîkariya jinepîrekê xeber dişîne bo Feqe Ehmed. Ew qewlê xwe datînin, cih û dem diyar dikin û direvin.	Feqe Ehmed li dawetê zavê ango pismamê Keyhan dikuje û Keyhan direvine.
Pîştî Revandinê	Pismamê Keyhan bi leşkerên xwe ve tê pêşiya wan. Keyhan, pismamê xwe û hin leşkeran dikuje leşkerên din jî ditirsin û vedigerin. Paşî derbasî Darişmanayê dibin.	Pîştî revandinê têne Stenbolê. Li wir Padîşah xelat didin wan. Ew ji Stenbolê diçine Darişmanayê.
Çêbûna du zarokên wan	Li gorî Babanî piştî ku Feqe Ehmed Keyhan ji Frengîstanê direvine ew hê nû wekî jin û mêran tevdigerin û du zarên wan çê dibin. Navê wan dêtînin Sileyman û Abdullah.	Li gorî Rich berî ku Keyhan bireve Frengîstanê du zarokên wan çê dibin. Navê zarokên xwe dêtînin Sileyman û Bûdak Keyhan.
Dayîna erdên Darişmanayê û tayînkirina mîr/Avakarê Mîrekiyê	Sileyman Babayê kurê Feqe Ehmed di riya babê xwe de diçe. Ew jî wekî babê xwe tevlibûna cîhadê dibe. Ji ber ku di şer de qehremaniyên mezin nîşan dide erdên Darişmanayê ji alî padîşah ve tê dayîn bo Baba Sileyman. Ango avakarê Mîrekiyê Sileyman Baba ye.	Li gorî Rich jî erdên Darişmanayê ji alî padîşah ve ji ber qehremaniyên Feqe Ehmed bo Feqe Ehmed tê dayîn. Ango avakarê Mîrekiyê Feqe Ehmed e.

### Encam

Tê dîtin ku hikayeta Frenk Keyhan û Feqe Ehmedê Baban herçiqas di texeyyûla gel de wekî efsaneyeke avabûna Mîrekiya Baban temsîl bike jî ew di heman demê de hikayeteke işqî û ji tradîsyona vegêrana hikayetên işqî ya edebiyatên rojhilatê ye. Bi taybetî di navbera wê û hikayeta Şexê Sen'an de ji alî honak û temayê ve xalên hevpar hene. Me di xebata xwe de du varyantên vê

hikayetê berawirdkirin û ev encam bi dest xistin. Xalên sereke û bûyerên her du varyantan hevpar bin jî ji alî qewîmîna rêza bûyeran û teşwîqa tevgerên kesayetan ve her du varyant ji hev vediqetin. Herweha varyanta Babanî hineke din bûyerên rasteqîn ve hatiye honandin û varyanta Rich hineke din xwedî honakeke şovalyeyî ye. Bo nimûne, hê di serî de varyanta Rich de dîyar e ku varyanteke efsanewî pêşdetir e. Feqe Ehmed ji ber zilma Bilbasiyan welatê xwe terk dike û sonda tolê dixwe. Lê di varyanta Babanî de terkkirina Darişmanayê bi armanca tevîbûna cîhadê ye ku dikare bê gotin ev sedem sedemeke êdî nêzîkê mimkûniyêye. Her du varyant ji hêla taybetiyên Keyhan ve jî ji hev cuda dibin. Li gorî varyanta Babanî, Keyhan piştî vegera ji Frengîstanê êdî kesayetek bijarte tê nîşandan. Berî Feqe Ehmed Keyhan ji Frengîstanê birevîne, Keyhan bêyî dilê xwe li ba Feqe Ehmed e. Ew wekî xenîmet bûye para Feqe; lê nexwestiyê pê re têkiliyêke kamil a jinûmêran dêyne û ji ber sebebeke biçûk jî revîyaye. Lê piştî vegera Frengîstanê, wê pismamê xwe ji bo Feqe kuştîye û bûye xwediyê du zarokan. Bereksê vê rewşê di varyanta Rich de Keyhan berî reva ji Frengîstanê êdî kesayetek efsanewî ye. Wê tena serê xwe li hemberî 400-500 mêrên Bilbasî şer kiriye û wan sekinandiyê. Lê piştî ku Feqe tê Frengîstanê êdî Keyhan dibe kesayetek edetî û efsanewîbûna Feqe dest pê dike.

### Çavkanî

- Ainsworth, W. F. (1842). *Travels and Researches in Asia Minor, Mesopotamia, Chaldea and Armenia* (Cilt 2). London: John Parker.
- Ates, S. (2021). The End of Kurdish Autonomy The Destruction of the Kurdish Emirates in the Ottoman Empire. H. Bozarslan & C. Gunes & V. Yadirgi (Ed.) *The Cambridge History of the Kurds*. İçinde (73-103). Cambridge: Cambridge University Press
- Atmaca, M. (2015). Frenk Keygan'ın Çocukları Babanlar. *Kürt Tarihi*, (20), 37-41.
- Atmaca, Metin. (2022). Bâbân. *The Encyclopaedia Of Islam Three*, s.70-72, Leiden: Brill.
- Attar, F. (2023). *Mantiku't Tayr*. (Yay. Haz. V. Başçı & N. Başçı). İstanbul: Turkuvaz Kitap.
- Başçı, V. (2019). Dunbuli Beyliği Tarihi ve Tarihi Kronikleri [XII-XVIII. YY.]. *Kadim Akademi*, 3(2), 63-114.
- Başçı, V. (2024). Sûfi-Siyaset İlişkisi Bağlamında Mevlâna Halid Şiirlerinde Baban (E)Mîrleri. *Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, (23), 1-28.
- Başçı, V. & Başçı N. (2023). Giriş. içinde Feridüddin Attar. *Mantiku't Tayr*, (Yay. Haz. V. Başçı & N. Başçı). 21-48. İstanbul: Turkuvaz Kitap.
- Bazîdî, M. M. (2010). *Adat û Rusûmetnameyê Ekradiye*. (Wer. Z. Avci) İstanbul: Lîs.
- Bedlîsî, Ş. (2014). *Şerefname Diroka Kurdistanê*. (Wer. Z. Avci) İstanbul: Azad.
- Behn, W. Bâbân. *Encyclopædia Iranica*. Erişim 12 Haziran 2024. <https://iranicaonline.org/articles/baban-2>
- Bozkurt, İ. (2022). *Aşiretler Tarihi*. İstanbul: Nûbihar.
- el-Babanî, A. (2019). *Siyeru'l Ekrad Baban ve Erdelan Kürtleri Tarihi [1523-1870]*. (V. Başçı, & E. Ceylan, Dü) İstanbul: Peywend.
- Friç, D. (2014). *Kürdler Tarihi ve İçtimai Tedkikat*. İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.

- Ghalib, S. A. (2011). *The Emergence of Kurdistan with Special Reference to the Three Kurdish Emirates within the Ottoman Empire, 1800-1850*. Ph.D Dissertation. Exeter: University of Exeter, Arabic and Islamic Studies.
- Filiz, M. Ş. (2024). Rengvedana Evîne di Romana Kurdî de. *International of Kurdish Studies*, 10(1), 75-97
- Karname-i Erdeşir-i Papekan. (1386/1966) (Yay. Haz. Behram-ı Ferehveşi). Tahran: İntişarat-ı Danışgah-ı Tehran.
- Kinneir, J. M. (1818). *Journey through Asia Minor, Armenia, and Koordistan in the Years 1813-1814 with Remarks on the Marches of Alexander and Retreat of the Ten Thousand*. London: John Murray.
- Kurnaz, C. (2010). Vuslat Yolculuğu. *Turkish Studies*, 5(3), 447-461.
- Naskali, E. Sâsânîler. *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*. Erişim 4 Haziran 2024. <https://islamansiklopedisi.org.tr/sasaniler>
- Nehrî, Ş. U. (2022). *Tuhfetü'l Ehbâb*. (Yay. Haz. V. Başçı) İstanbul: Avesta.
- Rich, C. J. (1836). *Narrative of a Residence in Koordistan, and on the Site of Ancient Nineveh, with Journal of a Voyage Down to Tigris to Bagdad and Account of a Visit to Shirauz and Persepolis* (Cilt 1). London: James Duncan, Paternoster Row.
- Tarduş, İ. (2022). *İngiliz Seyyahların Gözüyle Ondokuzuncu Yüzyılda Kürtler*. İstanbul: Avesta.
- Urmevî, A. M. (2001). *Mesnevî-i Gul u Nevrûz*. Stocholm: Upsalla University.
- Yamûlkîzade, A. (1919, Ocak 13). Kürd Tarihinden Baban Hanedanı. *Jîn* (9), s. 3-7.
- Yazîcî, T. (2022). *Mîrnameya Hekariyan*. (M. X. Sadîni, Çev.) Wan: Peywend.